

Qaîdeyên pêşwazîyê di xwendegeha lîseyê

KURMANJI

utbildningsinfo.se

Skolverket

Ji bo têketina nav
bernameya lîseyê
xurtan çî pêwîst e?

Ji bo ku rê ji we bê dayîn ku beşdarî bernameya netewî di xwendegeha lîseyê xortan de bibin, divê hûn:

- di dibistana bingehîn de Sala 9 ê tamam bikin, an perwerdehiya hemberî vê derbas bikin
- heta niha beşdarî bernameyên xwendegeha lîseyê nebibin
- di destpêka bernameyê de, herî kêr, di nîva sala teqîwmê de hûn bibine 20 salî

Têketina ji bernameyek pişeyî re pêdivî bi derbaskirina nişanên bi Swedî an Swedî wekî Zimanê Duyemîn, Îngilîzî, matematîk, û bi kêmanî pênc babetên din ên ji dibistana bingehîn heye.

Têketina ji bernameyek amadekariyê re pêdivî bi derbaskirina nişanên bi Swedî an Swedî wekî Zimanê Duyemîn, Îngilîzî, matematîk, û bi kêmanî neh babetên din ên ji dibistana bingehîn heye.

Ji bo bernameyên abûrî û zanistanên civakî, her wisa ji bo bernameya klasîk, ji neh babetên zêdehî pêwîst e ku çar babet erdnîgarî, dîrok, sîvîl, û ol bin.

Ji bo zanistên xwezayî û bernameyên teknolojî, ji neh babetên zêdehî pêwîst e ku sê babet, biyolojî, fizîk û kîmya bin.

Ji bo bernameya estetîkê, hemû neh ders hilbijarî ne. Dîsa jî, dibe testeke şarezayîyê bê girtin.

Ji bo têketina bi cureyek taybet gengaz e ku pêwîstî hebe bi zanistên berê yên di vê babetê de an jî yên di qada babeta ku taybetîya vê cureyê de ye.

Xala şarezayîya xwe
çawa hesab bikin

Bi piranî rêjeya daxwazkeran ji hejmara cihên ji bo bernameyên herî populer dibore. Dibistan paşê hilbijartinê dike. Kesên bi şarezatiya herî bilind tîn pejirandin. Xalbandîya şarezatiya koma xalan ji bo 16 babetên herî baş tîn nişankirin. Ji bo bernameyên bi testa şarezayîyê, her wisa xalên testê jî tîne hesabkirin.

Nirxên nişanê yên ji bo kesên ku di bihara sala 2011 de dibistana bingehîn bi dawî kirine:

MVG = 20 VG = 15 G = 10

Nirxên nişanê ji bo kesên ku di bihara sala 2013 de dibistana bingehîn bidawî kirine:

A = 20 B = 17.5 C = 15
D = 12.5 E = 10 F = 0 (bo nimûne biserneketin)

Nirxên nişanê ji bo pola blokê – ji bo nimûne, zanistên xwezayî (Fizîk, Kîmya, û Biyolojî) bi carêkirina pola blokê ya bi hejmara babetên nav blokê tê bidestxistin. Pola bloka rawestayî di sala perwerdehiya 2012/13 de hatiye derçûn. Nişana herî zêde – wekî ku xala şarezayîyê tê binavkirin – 320 xal in.

Destpêkirina li gel pêşwazîyê ji bo sala perwerdehiya 2014/15, kesê ku zimanek modern wekî zimanê bijartî xwendibe dê bikare nirxa vê nişanê li ser nirxa nişana 16 xalên herî baş zêde bike. Paşê xala şarezayîyê dibe 340 xal.